


SALEK
DI SER
TRAJÎDYA
EFRÎNÊ
RE DERBAS
DIBE

Tablo: Hunermend
Ahmed Kleige



PEYVA WELAT

Salek di ser trajîdya Efrînê re derbas dibe

Desteya sernivîs

Salek di ser dagîrkirina Efrînê re derbas dibe, di dîroka vî bajarê ciwan û aram de reştirîn û tarîtirîn sal bûye.

Di 22-1-2018an de, artêşa tirk digel çekdarên sûrî ên bi ser opozisyonê ve dest bi êrîşêke tund û berfireh li ser bajarê Efrînê kirin. Armanca ragihandî ji wê êrîşê re, li gorî hêzên êrîşkar ew bû (Rizgarkirina Efrînê ji terorê û parastina ewlehiya netewî ya tirkî), bi vê propogandaya derewîn cîhan xapandin. Piştî salekê ji dagîrkirina Efrînê, êdî hemû armancên dagîrkeran diyar bûn. Tawanên ku li ser dirêjahiya salekê bi destê dagîrkerên Efrînê hatin kirin û heya îro roj jî berdewam in nayên pîvanê, kiryar û tawanên wan hemû nîrxên olî, civakî û mirovahî derbaskirine. Êdî li Efrînê mafên mirov, zaqgon û yasayên navdewletî bi rengekî eşkere tene bînpêkirin.

Belê, nema tê veşartin ku armanca hêzên dagîrker guhertina nasnameya Efrînê ya kurdî ye, û hemû siyasatên ku li ser gelê kurd li Efrînê tene meşandin ew ji boyî bêkanîna vê armancê ne.

Ji salekê û vir de, gelê me yî kurd li Efrînê di dojecha dagîrkeriyê de di rewşêke pir xerab û dijwar de, di nava kuştin, talan, dizî, revandin, destdirêjiya li ser jinan, siyaseta erebkirin û tirkkirinê, terror û kîndariyeke reş de dijî, û li jêr durûtî û bédengiya navdewletî çarenûsa gelê Efrînê ketiye destê çeteyên bê ol, bê sinc û bê rewîşt.

Di wê dema ku bi hezaran kurdên Efrînê yên ku di encama dagîrkirina bajêrê xwe de der bi der bûne, hatine koçbarkirin û bi dûrxistin di rewşêke pir

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî



Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediye xwe ne û nivîskar berpîrê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya


xerab de, di konan de dijîn, em dibînin ku hêzên dagîrker bi hezaran Gelo kîjan zagon, kîjan ol û kîjan sinc van kiryanan rewa û helal dike, ji bilî zagona diz û serseriyar ?

Li hemberî hovîtiya dagîrkeran, gelek kar û xebat ji alî çalakvanên kurd hate kirin, di nav de belgekirina bînpêkirin û tawanên dagîrkeran û vegehustina rewşa gelê Efrînê ji bo raya giştî ya navdewletî, herwehanên ku ji alî mafnas û parêzvanên kurd dibin da ku doza Efrînê bibe dozeke navdewletî. Bêgoman ev ked û xebat tekoşîneke aştîyane pir buha ye û cihê rêzgirtinê ne.

Efrîn, ne tenê ji bo gelê kurd lêbelê ji bo hemû cîhana azad trajîdya serdemê ye, çendî hêzên dagîrker bixwazin wê ji kirasê wê yê kurdî derxînin, hemû hewldanên wan yên qirêj dê têkbiçin.

Çendî em bi vê boneyê xemgîn dibin û diêşin, hewqasî jî em bawer in ku roja rizgarbûna Efrînê nêzîk bûye. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution



NÎŞAN Û SIMBOLÊN OLÎ DI ZARGOTINA BIÇÛKAN DE

Salihê Heydo

Bêguman, cîhana zarokan nekêmî ya mezinan e, ji ber ku tiştên ku mezin pê hest dibin wisa jî zarok bi wan hest dibin, lê dibe ku mezin zû bi zû wê derbirrîne naxînin der ji ber gelek sedeman, lê zarok yekser wî hest û pêjna tenik û nazdar li gorî zanîn û kêr û bandore wî tiştê ku li ser mejî û derûna wan pêdaye bi awayekî zelal, ron û rastyeqîne tînin kifşê û derdibirrin.

Çawa tê zanîn ku kêr û bandora olê û tirsê ji xwedê di gel rêzgirtin û rûmeta symbol û nîşanên ayînî li cem zarokan gelekî pîroz û giranbuha ne jî, lê tevî vê yekê jî em dibînin ku zarok carnên wan nirxan û pîrozgehan bînpêdikin ji ber ku di nerîna wan de ev nîşan bi sextekarî hatine rastê û ne rastiya civakê û ol û ayîna rastyeqîne ne weke (şêx, melle, babederwêş, ocaxzade, sofî, keşe û qewal), nemaze ew kesên sextekar, ji ber ku di dîrokê de rola babederwêşan roleke pir xerab bû, di serdema Osmaniyan de hemîyan qelawizî û nokeriya gel dikirin, li nav êl û eşîran, li gund û zoman digerrîyan, bi navê ocaxzadeyan rewşa millet û civakê diguhestin desthilatdarên sultanên Osmaniyan, lewre kesk li serê xwe digerrandin, xiştê wan di destê wan de bû, tûr û kodikên wan li nav millên wan bûn û derbasî malan dibûn bê sînor. Bi vî dilqî kevaniyên malan, kalemêrên oldar û zarok pir ji wan ditirsiyan û geştê wan weke (rûn, duhn, nîvişk, savar, mewîj) û çî tiştê ku li mala wan heba didane wan, dema hinekan nadaba

yan jî ji wan neqedyaba, ev babederwêş yekser li erbanê dixist û pesteyên olî li ser xwedê û pêxember digotin, û xiştê xwe dikişand, kef bi dev diket û xwe bi derewan bi cezmê dixist, di wî hingî de kevaniya kevaniya reben ji tirsan re neçar dima tiştê ku heba ji wî re pêşkêş dikir.

Evan dîmenan yekser kêr û bandor li hestê zarokên kurd kiriye, lewra ev sirûda zengîn û bi wate ji sîmax û derûna wan derketiye û bi vî awayê jêrîn herrikiye :

Hatî gundê me şêxik
Şêxkê bi kesk û kumik
Li ser piştê wî tûrik
Li ser milê wî kodik
Tûr ji tûrê savarê
Geştê danê êvarê
Hemû komkir bi xiştê
Bi erbanê 'w niviştê
Tirs xist dilê van kala
Jin û kevanyên mala
Ev keskûlê şêxan e
Şêxê kernepêxan e
Xelas nabin ji bêşa
Ji van şêx û derwêşa
Birin rûnê hillika
Dan hev li va berxika
Zarok û jin tirsandin
Xişt li wana kişandin

Em dîsa binêrin li vê sirûda jêrîn ku zarok çawa rexne li van kesên older ên sextetê dikin ku bûne sedema çewisandin û zordestiya li civakê nemaze ji hêla aborî û derûnî ve, û ti cudabûnê di navbera simbolên olî de nabînin, çî misilman, xiristyan û êzîdî be, ji ber ku ev hemî di nav gelê kurd de cî girtine û bi awayekî rast û dirist zarokan ew destnîşan kirine dema dibêjin:

Apê melle ellele
Apê sofî wek rovî
Apê hecî teşqelçî
Apê seyid mexeyid
Apê keşe çek reş e
Heydê ji vir bimeşe

Her wiha dîsa ji hêla kedxwariyê de van nîşanên ku me gotî di zargotina bi çûkan de weke kedxwar hatine nimandin û rexneyên tûj li wan hatine kirin lê vê care keşe û mele û qewal her sê dane ber hev bê cudabûn û mêldarî dema vê sirûdê dibêjin:

Ya ellah û ya girîk
Keşe 'w melle bûn şirîk
Genim xwarin tev firîk
Berê xwe dane qewal
Hersê pev re bûn heval
Şêwrek danîn bi tîfaq
Van feqîran baqebaq

Ev şirovekirin û danasîn nayê wê wateyê ku zarok şerê nîrx û rêbazên ol û ayînê dîkin, lê belê wekî her kesê mezin ew jî yên sextekar ku dibin xaçî û perda ol û ayînê de xwe veşatrine wan riswa û şermezar dîkin.

Di dawiyê de em dikarin bibêjin ku hest bi zulm û zorê, bi xweşî û nexweşiyê di her çax û deman de li ser zarê biçûk û mizinan ti sînor û bend jêre nînin, lewra em dibînin ku zargotina biçûkan bi cûreyên sirûdan tîr û dewlemend e. ■





REWŞENBÎR

Cindiyê Xizan

Her gotinek di zarê kurdî de, ji rehek dîrokê kat daye, ji lewra her gotinek, wateyek jê re heye, û Ji ber ku di vir de mijarê me, li ser rewşenbîr, û rewşenbîrtiyê ye, divê berî her tiştî em zanibin, bê wateya, gotina rewşenbîr, ji ku hatiye..

Gotina rewşenbîr, gotineke hevdûdaniye, ji du gotinan pêk tê, rewşen, an ronahî, û bîr, an raman, hiş, dibe ronahiya hiş.

Rewşenbîrtî çiye...?..

Ew bi xwe şîrovekirina her tiştên ne diyar, û ne naskirî, ji bo ronahîkirina hiş, û dewlemend kirina ramanên civakê, û paqij kirina ûjdan, û sererast kirina hestên mirovan, û fêr kirina wan li ser sinc û rewîştên qenc û çê, û avakirina wan li ser rastiya mirovahiyê rind û xweşik, û avakirina welatan bi nîşankirina sînor, û tixûban e. Rewşenbîrtî ne bi hildana al û beyreqan e, lê bi avakirina millet, û çêkirin û afirandina wî li ser zanebûn û rewîştên paqij û vîneke xurt e.

Ev tevde ji her xwendevan, û rewşenbîrî tê xwestin, ji ber her kes li her derê, û di her demê de, dikare her tiştî bike, û rewşenbîrê ku milletê xwe zane neke, dijminê xwe qezenc dike.

Rewşenbîr kiye...?..

Ne her kesê xwenda nivîskar e, û ne her kesê nivîskar zana ye, û ne her kesê zana jî rewşenbîr e, lê yê zana yê ji xwe re sermiyanekî ji zanebûnê, ji bo pîrbûna xwe bi ser hev de, û pêwiste berhemên wî mîna nan, û avê bin, kesek jê bê pehir nemîne, û hey em binerin, li siyasatmedarê cîhanê, li rewşenbîrên xwe vedigerin, lê mixabin heta nuha nivîskarên kurd nivîskarî nebûnin ramanger, ji lewra li bendî tomet yan bobelatekê ne, ji bo li ser binivîsîn.

Û Pir kes henin xwenda, û xwedî fêrname ne, lê mixabin nizanin her tiştî şîrove bikin, tenê di karê xwe de jîr û jêhatî ne, hew ji bo danheva sermiyanekî, fêrnameyên xwe bi kar tînin, û ji bo pê jiyana xwe, xweş, û kamûran bikin, ew jî tenê di bergeha karê xwe de raman dikin, û ji êş, û kul, û derdên milletê xwe, dûr ketin....

Mînak:

Yê endezkar, dikare mala dolmendeke ava, pir bi rewş, û xeml bike, lê wî ha ji gund û bajarên wêrankirî di welatê xwe de tune, û nîzane wêrankirinê ji ser bide alî, dikare mezintirîn bajarekî ava bike, lê ne amadeye, ku mirovekî di welatê xwe de ava bike..

Yê bervedêr, berevaniyê di ber tewanbarekî de dike, û wî ji girtîgehê derdixîne, lê wî ha ji girtiyên milletê xwe di girtîgehên dijmin de tune, û dengê qîrîqîra wan naguhêze, û naxwaze bibhîze jî.

Yê bijîşk, dikare laşekî ji hev ketî bi ser hev de, lê nikare sînore welatê xwe bi ser hev de, û..... hwd..

Ji ber ermenca wan hew ji bo xweşkirina jiyana wan ya taybet e.

Lê rewşenbîrê rast û resen ew kesê xwenda û zana ye, yê ku zanibe çawa zanebûna xwe ji boyî mirov û mirovahiyê bi kar bîne, û xwe bike ronahiya arê jiyânê, û pê rêya gelê bindest, ronahî bike, û wê ronahiyê bighîne bîr û ûjdanê gelê xwe û tevaya gelê cîhanê, ji bo rêya falata xwe pê nas bikin.

Rewşenbîr ne ew kesê li piş masakê rûniştîbe, û pelan di ser hev re bibe, û pînosa wî li hêviya pelandina tilîyên wî bin, lê ewe, yê karibe her roj tiştên nuh bide millet, û dema pînosa wî ji mûdamê biwerive, karibe bi peşkekê ji dilopek xwîna pakrewanekî pirtûkxanê dasîtan bi nivîsîne, û ji ber ew bijîşkê gel e, divê zanibe birînê paqij bike, ji bo zanibe derman bike.

*Sê nîfşên rewşenbîran hene:

1-Ên ku tiştên nuh dipejirînin, lê ji xwe re dihêlin, nadin tu kesî.

(Ew kesin kedxurin)...

2-Ên ku tiştên nuh napejirînin, û li ser kevinê xwe dimînin.

(Ew ne li pêş dikevin, û ne jî li pêş dixînin)...

3-Ên ku tiştên nuh dipejirînin, jê qezenc dikin, û pê qezenc dikin.

(Ew rewşenbîrên resen, û sermedî ne, ronahî û hêviya miletan in)...

Mercên rewşenbîrtiyê:

1-Her wiha pêwiste çî kesê xwendevan û zana, bi xwendin û çandeweriyê xwe bigihîne asta rewşenbîrtiyê, û mercên wê, di xwe de biafirîne, ji ber ku bê xwendin rêya rastiyê nayê nas kirin... û buhar bi çîçekên hişk, geş nabe.

2-Ji bo wek ku bixwaze binivîsîne, ne wek ku jê tê xwestin, pêwiste azadiya ramangêriyê li cem peyda bibe, û zanibe bê çî dixwaze, ji bo karibe çî bike, û xwe berpirsiyar di ber miletê xwe de bibîne.

3-Ji ber her kesek şêwazek axaftinê jê re heye, divê yê rewşenbîr, zanibe çawa tiliyên kesê rûbarî xwe ji guhê wî derxîne, û bihêle lê guhdar bike.

4-Ji ber ne tim yê hemberî mero, ji mero li ber nakeve, lê carcaran mero nizane wî li berxîne, ji lewra divê yê rewşenbîr zanibe çawa gotina xwe bigihîne mejiyê wî, ne di guhê wî de bihêle.

5-Ji ber ku bindestiyê xizanî afirandiye, û nezanî rapelûçekek ji rapelûçekê xizaniyê ye, milet dorpêç kiriye, wî xistiye giran xewekê, û ji ber yê zane divê li yê nezan bigere, pêwiste yê rewşenbîr, hewl bide, û xwe bike mîna tîrêjê, û derbasî her cihên tarî bibe, û çalakiyên xwe, ji bo şiyar kirina miletê xwe bi kar bîne...

6-Divê zana, û cegerdar be, ji bo karibe guhertinê çê bike, pêşketinê biafirîne, bê tirs û saw bide pêşiya gel û rêya rast jê re diyar bike, û bi wê cegerê karibe guhertin û pêşketinê çê bike. Rewşenbîrê ku nivîsandin û ramanên wî guhertinê di xwezaya wî de çê neke, nikare guhertinê biafirîne.

7-Dijminên doza miletê kurd, çand û geltora wî tevde dizînin û lê dane mandelê, pêwiste rewşenbîrê kurd, dîrokê bi serê pînosa xwe vepixêre, û rehê resen ji çanda miletê xwe kat bide, ji bo zanibe çanda wî lê vegerîne, û wî bi miletên cihanê bide nas kirin.

8-Ji ber rêxistin pir di nav gel de damezirîne, behweriya xwe bi xwe wenda kiriye, ji lewra yê rewşenbîr divê zanibe behweriya milet lê vegerine, ne bi xwe bîne.

9-Ji bo karibe tiştên dil û mejiyê xwe derxîne, pêwiste ne girêdayî tu rêxistinê be, tenê girêdayî doza miletê xwe, û mirovahiyê be...

10-Ji bo karibe xwe bêtir li pêşxîne, û bê kêmanî derbasî nav gel bibe, pêwiste rexneyan bipejirîne..

11-Pêwiste xwe di ser milet re nebîne...ji

ber nerîna teng, mejiyê teng nîşan dide..
12-Rewşenbîr, ew çavkaniya, mileta ye, her kes jê dibe, pêwiste bi rewîştin pir bilind, û bê ezezi, têkiliyên xwe bi her civakê re çê bike.

Rola rewşenbîran:

her kesek du jiyanên wî henin, jiyanek zindî ye temenê wê kin e, lê jiyanê din piştî mergebûnê ye, ya sermedî ye. Hey mirov nexwaze bimire, gereke jiyanê xwe ya zindî ji bo ya sermedî bi kar bîne, û pir çalakiyan ji bo wê bike, û temenê jiyanê sermedî pê dirêj bike.

-Bê gûman rêjîmên dagerker, zane û rewşenbîrên kurd, binçav dikirin, yan jî ew ji xwe re dikirin kole, ji bo kes nikaribe tekoşinê ji bo welat û welatparêziyê bike, lê dijmin tenê ji bo hilandina kurdan kurdistan dagîr kir, û kurdistan ji kurdan vala kir, û li biyaniyê, serê wan ji kurdistanê vala kir, cîyê koçeriya wan kir cîyê koçberiya wan.

qey dawera me eve, hestiyên me ji qesla şîrîne, her kes dikeviye, û dimije, û heta nuha dijmin goştê me dixwe, bi hestiyên me jî ber qîlên xwe paqij dike, lê ne her tiştî em bikin gunehberiya dijmin e, lê ji ber ne xwedî derketina me li çand û geltora me, û ji ber rêxistinên kurd milet ji mejî de perçe kiriye, û ew kiriye dijminê bir, û birayê dijmin, hiştiye ku dijmin rewatiya mafxuriyê bide xwe, lê hey em nexwazin dijminê me bi serkeve, divê em ermenc û xwestekên wî pêk neyin...

-Ji ber wilo, pêwiste yê rewşenbîr xwe perwerde bike, ji bo karibe perwerdeyê bike....

-Bi kêmanî yekî mîna xwe biafirîne...

-Pêwiste tevaya rewşenbîrên kurd, hewl bidin, ferhengê giştî biafirînin, ji bo yek kirina hemû zarvayên kurdî..

-Rastkirina bilêvkirina gotinên kurdî..

-Di roja tomet û bûyeran de bi rola mûral hildana miletrabin.

-Pêwiste bi rola hilkirina tiştên ne çê, û çandina tiştên çê li şûnê rabin..

Bera em tevde behwer bin, ku bê xwendin, em dijminê xwe nas nakin, û heta em wî nasnekin, em nikarin wî ji welatê xwe derxin. ■

DR. NÛREDÎN ZAZA...

1919 - 1988


Dema mirov bîranînên Dr.Nûredîn Zaza dixwîne xwe li hemberî jiyaneke dramatîk ku tijî bûyer û serpêhatiyên seyr û trajîdîk e dibîne. Di pêvajoya wê jiyana zengîn de, em mirovekî, lehengekî, rewşenbîrekî, ronakbîrekî û kurdperwerekî bejinbilind vedibînin ku ew nêzî lehengên sînemayê an roman, çîrok û efsaneyan e, di heman demê de jî ew bîranînên nivîşka kurtedîroka gelê kurd ji destpêka sedsaliya bîstan ve ji me re diyar dike.

Dr.Nûredîn Zaza di destpêka bîranînên xwe de ku di pirtûka xwe ya bi navê (Jiyana min a kurdî) belav kirine çêla bajarê ku lê ji dayik bûye dike û dibêje : Di serdema dewleta osmanî de, li bajarekî ku li ber çavkaniya çemê Diclâyê dikeve û bi (sifirê) navdar e, li welatekî çiyayîyî pir bedew, li Kurdistanê Turkiyê min çavê xwe vekir..cihê jidayikbûna min yê ku newaleke kûr û fireh wî dike du beş bajarê Maden e.

Zaza berfireh çêla bajarê xwe û qonaxa zaroktiya xwe dike, di pêvajoya axaftina xwe de hemû bûyerên dîrokî yên girêdayî rewşa deverê û gelê kurd ku di wê qonaxê de rûdabûn diyar dike, û rewşa siyasî, aborî û civakî bi bîrweriyeke berz û bilind dinirxîne.

Zaza li nav xwezaya bajêrê xwe ku wek bihişteke zemînî bi nav dike zaroktiyeke pir xweş derbas dike, û ji ber ku biçûkê xwişk û birayên xwe bûye ew delalîkê bavê xwe bû, û pir bi dêya xwe ve girêdayî bû.

Piştî têkçûyîna şoreşa Şêx Seîde pîran desthilatdariya dewleta Turkiyê siyaseta tunditûjiya hovane û zordestiya faşîzm li ser gelê kurd



meşand, di encamê de dora 30 kesî ji Madenê ji alî leşkerên Turk ve hatin girtin di nav wan de bavê Nûredîn Zaza, apekî wî û birayekî wî bûn.



Di derbarî vê qonaxa dijwar de Zaza dibêje : Ew destpêka dogehê bû, min her tişt nizanîbû çiku ez şeş salî bûm, lê hemû tiştên ku min dibihîstin cihekî metisînê bûn, bi şev û roj karê dêya min girî bû, kesî newêrîbû navê Kurdistanê anîba ser zimanê xwe....Li dibistanê em neçardikirin ku bibêjin (Em Tirk in), li malê jî gegeşeyên siyasî rawestiyên...û em li ser bav, bira û apê min yên girtî pir ditirsiyan.

Bûyera herî xemgîn û bi êş ku di zaroktiya Zaza de rûda koçbarkirina dawî ya dêya wî bû, wê hingê ew hîn 9 salî bû, lê xwişka wî Gulçînê dikarîbû dilovanî û hezkirina dê bide birayên xwe yê biçûk û nehişt ku ew bi wendakirina dêya xwe hest bibe.

Zaza xwendina xwe ya seretayî li bajarê xwe bi dawî kir û ji bo xwendina navendî berê xwe da Amedê - bajarê ku birayê wî yê bijîşk Dr.Nafiz lê kardikir- di wê demê de, zordestî û sitimkariya dewleta Turk li ser kurdan gihiştibû asteke pir xerab, heya axaftina bi zimanê kurdî hatibû qedexekirin, û siyaseta tirkkirinê bi rengê berfireh li ser kurdan dihate ferizkirin.

Desthilatdariya dewleta Tirk hemû rewşenbîr û ronakbîrên kurd armancdigirtin û diavêtin binê zindanan, vê yekê birayê Nûredîn Dr.Nafiz - ku ew yek ji rewşenbîrên kurd yên kurdperwer bûye- neçarkir ku berê xwe bide Sûriyê. Di sala 1930 de Nûredîn zaza yê 11 salî digel birayê xwe Dr.Nafiz daketin Sûriyê û li bajarê Helebê bicîbûn.

Dr.Nafiz dermangeha xwe li Helebê vekir û birayê xwe



Nûredîn li dibistana (Zemîna pîroz) a Ferensî ku ew baştirîn dibistana taybet bûye li bajêr tomakir.

Rûniştina herdu birayan li Helebê dirêj nekir. Di dawiya sala 1930 de berê xwe dane Şama paytext. Demeke kurt li Şamê man piştê zîvirîn herêma Cezîrê çiku karê Dr.Nafiz hate veguhestin devera Eyn Dîwarê û ev biryar li ser daxwaza wî bû. 5 salan li Eyn Dîwarê man piştê çûn Qamişlo, li wir Dr.Nafiz dermangeha xwe vekir û digel birayê xwe Nûredîn bi cih bûn.

Hêjayî gotinê ye ku Dr.Nafiz bijîşkekî pir dilsoz û dilovan bû, xemxwerê êş û derdên gelê xwe bû, pir alîkariya hejar û belengazan dikir, û li bajarê Qamişlo û hemû devera Cezîrê bi mirovahiya xwe navdar bû.

Nûredîn hestên netewî û welatparêzî ji birayê xwe wergirtin û bi rewşenbîr û ronakbîrên kurd bi taybetî nemir (Cegerxwîn û Celadet Bedirxan) bandor bûye, û hest bi êş û azariya gelê xwe kiriye û xwest ku wî ji vê rewşa xerab û zulm û sitimkariyê rizgar bike.

Piştî bûyera komkujiya Dêrsimê, Zaza bîrnameyek derbarî siyaseta dewleta Tirk ya li dijî gelê kurd de amade kir û serkêşiya şandek ji xwendekarên kurd li dibistana Ferensî û taxa Kurdan kir û ew bîrname radestî balyozxaneyên dewletan li şamê kir.

Ji wê şandê yekemîn komeleya xwendekarên kurd ku navê wê (Hêvî) bû hate damezirandin û rolek giring di hişyarkirina genc û ciwanên kurd de li Sûriyê lîst, û zemîn li ber damezirandina yekemîn partiya siyasî ya kurdî li Sûriyê di sala 1957an de geşkir.

Di derbarî wê qonaxê de Zaza di bîranînên xwe de dibêje :

Ez pir bandorbûm bi wan bobelatên ku bi serê gelê

min ve hatin. Dema ku cenga cîhanî ya duyem destpêkir, di nav kurdan de min hewil da ku wan hişyar û birêxistin bikim ji bo pêşwaziya wê roja ku paradox li rojhilata navîn bête guhertin, çiku diyar dibû ku nexşeya rojhilata navîn ya ku di encama zincîrek ji nîr û lihevkerinên awarte de piştî cenga cîhanî ya yekem hatibû danîn dê bête guhertin, ew nîr ji her kesî re zelal bûbûn û kurd ên ku xwe kirin qurbanî ji bo berjewendiyên gelên din û li ser qurbangeha berjewendiyên zirhêzên cîhanî pir bi wan êşyan. Tiştê ji bo me pêwîst ew bû ku em vê carê jî neyên xapandin û vê derfetê bi kar bînin da ku mafê xwe yê rewa feriz bikin. Birayê min dixwest ku ez bijîşkariyê bixwînim, û tevî siyaseta nehim ta ku xwendina xwe bi dawî bikim, lê dema dît ku ez li ser biryara xwe rijdim ew jî jê razî bûye.

Zaza jiyana xwe tevde ji bo doza gelê xwe terxand, bi hişmendiyeke berz, ronakbîriyeke kûr û hesteke neteweyî zelal û pak, bi wefedarî û wêrekiyeke bêhempa rêya xebat û têkoşînê girt.

kutejiyana Zaza ya siyasî

-Di sala 1944an de, dema ku xwest xwe bigihîne serokê şoreşa kurdî nemir Mustefayê Barzanî, li Iraqê ji alî desthilatdariyê ve hate girtin, salekê di zindanên Iraqê de ma, pir zor û êşkencî di wê zindanê de dît.

-Di sala 1945an de diçe Libnanê, li zankoya Ferensî, beşê zanistên siyasî dixwîne.

-Di sala 1947an de, bawernameya Lîsans di zanistên siyasî de wegdigire.

-Di sala 1949an de, ji bo dewamkirina xwendina xwe berê xwe dide Swêsrayê, li wir bawernameya Doktora di felsefê de werdigire.

-Di sala 1949an de, digel çend



hevalên xwe Komeleya Xwendekarên Kurd li Oropayê dadimezirîne.

-Di sala 1957an de, digel çend hevalên xwe Partiya Demoqrat a Kurd li Sûriyê dadimezirîne.

-Di sala 1960 de, digel çend hevalên xwe ji alî desthilatdariya Sûriyê (Hikûmeta yekîtiyê) ve tê girtin û zindankirin.

- Di sala 1961 de, wek kandîdê tevgera siyasiya kurdî ji bo perlementoya Sûriyê tête bijartin, lê rêjîma netewperest nehişt ku ew hilbijartin herin serî, û sextekarî bi kar anî, di encama siyaseta şofînist a rêjîmê Zaza careke din tê girtin.

-Di sala 1967an de , ji ber zordariya desthilatdariya Sûriyê direve Turkiyê, lê desthilatdariya Turkiyê jî dev jê bernade.

-Di sala 1970 de berê xwe dide Siwêsrayê û jiyana xwe ya mayîn li wir derbasdike.

-Di 7-10-1988an, li Lozanê, paytexta Swêsrayê koça dawî dike û li goristanê Lozanê tê veşartin.

Berhemên Dr. Nûredîn Zaza :

Zaza bi zimanê kurdî, erebî û ferensî nivîsandiye, gelek gotar û helbest di kovarên Hawar û Ronahî de belavkirine.

Pirtûkên Zaza yên çapkirî jî evin :

-Destana Memê Alan

-Romana (Şivanê Kurd) ya Erebe Şemo ji Ferensî wegerandiye Kurdî.

-Dîwanek helbestê bi navê (Şerê Azadiyê)

-Pirtûka (Jiyana min a Kurdî) bîranîn bi zimanê ferensî.

-Pirtûka (Kurdistan) bi zimanê ferensî

Hêjayî gotinê ye ku hevjinê Zaza jineke Swêsrî ye, guhdan bi rewşa kurdî dikir, kurekî wî jê heye navê xwe Şengo ye. ■

Jêder :

-Pirtûka (Jiyana min a kurdî) Dr.Nûredîn Zaza

-Enternê



HÎSÊN MAMÊ :

"Helbest pencereya minî azadiyê ye"

Hevpeyvîn: Imran Yûsiv

-Destpêkê, em dixwazin bi çend hevokan hûn xwe bi xwênerê Welat bidin nasîn ?

Navê min Hisên Mamê ye, di Adara 1982 an de li bajarê Hesekê li taxa Nasra ji dayik bûme, ev çar sal li Elemanya rûniştî me.

-Kengî bayê helbestê li dilê we da, û çawa we dest bi nivîsandinê kir, di derbarê wan destpêkan de hûn çi dikarin ji me re bibêjin ?

Di sala 2001 de bi şeweyek kesayetî min xwe fêrî zimanê Kurdî kir, bi saya helbestên ku bibûn stran, paşê di demek ne pir de min hin hewldanên nivîsandinê kir (helbesta klasîk) û şensê min jî hebû ku hinek Nivîskaran nas bikim, carcaran min jî wan re dixwend û bi rastî wan gelek piştgiriya min kirin.

Di wê demê de û jiber ku ziman û wêjeya kurdî qedexe bû me dikarîbû tenê di Odeyan û bi dizî Şevbuhêrkên hunerî û yê Helbestê lidar bixista.

-Helbest ji bo we çi wateyê dide ?

Bi sebareti min ev tişteke bêhempaye dema ku karibim hestên xwe bider bînim çi kêf, xweşi, şahî, êş, yan jî xemgîni be.

Helbest pencereya minî azadiyê ye.

-Pir kes hene ku xwe li nivîsandina helbestê kirine bele, û xwe dibînin helbestvan, gelo ev diyarde ji çi hatiye, û bi dîtina we yê helbestvan kiye ?



Ji mafê her kesî ye ku binivîse . Ez bi xwe hêviya min ewe ku miletê Kurd bi tevahî binivîsin, asta vê nivîsandinê çi be jî di nerîna min de ne aloziyeke mezine, jiber ku Pirtûkxaneya Kurdî pêdiviya wê bi berhemana heye . Di pêşerojê de ev karê Rexnevanan e ku van berhemana Bêjîng bikin.

-Digel helbesta klasîk ya kurdî, hûn helbesta nûjen jî datînin, hûn çawa dikarin herdu şîwazan li gel hev bicivînin ?

Hin Nivîskarên Kurd ên ku bi zimanin biyan dinivisandin, mixabin digotin: em nikarin hestên xwe bi zimanê kurdî binin der, nemaze helbesta Nûjen wek ku digotin zimanê Kurdî zimanekî seqet e.

Bi rastî ev sedemek sereke bû ku helbesta Nûjen binivîsim.

-Di derbarê berhemên we de, gelo heya aniha çi hene, çi ji wan çap bûne ?

Ji sala 2013 an de 2 Dîwan amade ne, lê min çap nekir û ne diyare kengî çap bikim.

Li gel helbestê, min hin Çîrok nivîsand û carina di warê wergerandinê de dixebitim.

-Gotina we ya dawî

Ez gelek spasiya kovara Welat û hemî Karmend û Xwênerê wê dikim û bi hêvî me ku tim serkeftin para we be di gel rêz û silav.

**Birînê ser birînek din vedaye
Bi ser de barekî xwê jî xuyaye**

**Çi talan e çi halan e birawo
Disuhte dil çima Derya zuha ye**

**Ji kê bazdin ji kê em xwe veşêrin
Li çep ar e li rastî me qeşa ye**

**Çi heye ka ji mer bêjin çi heye
Çima para me tim derd û bela ye**

**Qe dengê me tu nakî hey xwedayo
Heware ev ne govend û sema ye**

**Bi me qey nakeve carek bikenin
Girî pûç bû b'xwedê hêsir nemaye** ■



FERHENGOK

Afirandin	خلق
Afir	اسطبل
Agirkuj	اطفائي
Ahkêş	متحسر
Ajeqor	الشديد الضعف
Avjenî	سباحة
Alênc	قيلولة الاغنام
Aloz	معقد-متشابك
Alûsî	أناقة-رشاقة
Amojgeh	معهد
Enîbeş	منحوس
Aram	صبر-هدوء-سكينة
Aramgeh	مثنوى-ضريح
Aran	بادية الصحراء
Arandin	اثارة- اغراء
Ardû	وقود
Arengî	المغص
Arezû	رغبة- شوق
Asik	ظبي-غزال
Astank	عتبة



قصص قصيرة جداً

محمد الفتحاح



الأراجيح التي أرسلت مؤخراً إلى بلدي النائية

«أرجوحة ما»

وحدها كانت الجدة بجانب الأرجوحة، الفانوس الصغير رسم تجاعيد الوجه البارد، استسلم الطفل لضحكته وحاول أن يرمي نفسه في حضنها، إلا أن الأرجوحة قذفت بالجسد نحو قبوها الأبدية.

...

«أيضاً أرجوحة»

تذكرت القبلية والوردة والعرشة في جسدها، وحين مدت يدها لتضغط بقوة الأصابع المستقرة على خصرها، كانت الأرجوحة تهتز بقوة لتقذف الجسد نحو قبوها الأبدية.

...

«أرجوحة أخرى»

وجوه غريبة كانت تقتحم أحلامي مؤخراً. الليلة وحين رفعت قلبي نحو القمر تحول خنجراً وهاجمني، عبر النافذة رأيت جسدي يقذف أشلاء نحو قبوها الأبدية.

...

«بالإضافة إلى الأراجيح أرجوحة»

ماتت أمس آخر عجائزنا، وفي المكان المعتم والصامت برائحة النار، يد ما امتدت لتهز الأراجيح بكل الأجساد الخائفة، كانت أصواتهم عويلاً.

- وحدوا الخوف.. وحدوا الخوف. نادى المؤذن. إلا أن الأراجيح كانت تهتز لترمي كل الأجساد نحو قبوها الأبدية.

.....

«إحساس»

اقترب من وجهها الناعم، ومسد بيديه جسدها الغض، وحين استقرت يده على خصرها. همست:

- إنه يراقبنا.

تحرك نحو الباب إلا أنه لم يجد أحداً. ثم أومأت نحو النافذة التي لم يكن خلفها أحد. مساءً استسلمت لريح قبلاته الدافئة، إلا أنها كانت ما تزال تُدير أصبعها للجهات الست. نحو العيون الكثيرة التي تراقبها. ■

«تحقيق»

اليوم فارقته الحياة، شاهدتُ قبوري واليوم الآخر، رجالاً كانوا ينبشون القبر ويخرجون جثتي المملوطة بالدم، كانت أمي تبكي على أقدامهم لكنهم أبوا إلا أن يحققوا مع الجسد. ■

«انتصار..»

نامت فوق سرير الفراشات وحلمت بالغربان تأكل نهديها الصغيرتين، في الليل مسحت ما في ذاكرتها من أرقام.

أمام شجرة البلوط القديمة، في أقصى المدينة المجاورة لضاف روحها رسمت يومها الأخير كان لا بد أن تقف لتعد أيام حياتها لحظة بلحظة. ومن خلال تلاطم الأوراق العريضة كانت ترى عيون الله تراقبها مضغت الريح فستانها الوردي الزاهي وعلى بطنها ارتسم وجهٌ حلمها، أيُّ قوةٍ على الأرض تستطيع أن تطفئ ذاك اللهب المتصاعد نحو العيون، الحارق كل مساحات الأمل.

أطفئت الشمس نورها فوق الجسد الهارب من بقايا الروح، حين كتبت على كف قدرها صلبوا العصافير فوق مقصلة الخريف فات زمن الانتصار. ■

XWEPARASTIN DAYIKA AFIRANDINÊ YE

Aras Mihemed

Agir bûka çille ye, ardûyê agirê me jî mazot e, lê mazota me ne ti mazot e.

Ji bo xweparastina ji sermaye zivistanê xelkên rojavayê kurdistanê û tevahiya Sûriyê ji mêj ve sopeyên (argûnên) mazotê bi kar tînin. Berî ku kirîza Sûriyê destpêbike hemû petrola ku li Sûriyê dihat derxistin li parzûngeha Banyasê ya ku li perava deryaya sipî dikeve dihat parzûnkirin, lewre mazota me pir zelal û paqij bû.

Piştî ku şer li Sûriyê gûr bû, piraniya bîrên petrolê ji destê rêjîmê derketin, rêjîmê jî hemû karmendên xwe kişandin, û ew boriyên ku petrola xam digihand parzûngeha Banyasê ji kar hatin derxistin.

Salekê gelê Sûriyê bê mazot ma, di wê salê de bi sed hezaran dar hatin birrîn, û weke êzing hatin firotin, di encamê de bi hezarên donimên daristan û bejahiyên bi dar rût bûn.

Dar û êzing jî neman, vêca mazota (şewatoka) peyda bû. Li deverên ku bîrên petrolê pirin bi taybetî li herêma Cezîrê û Dêra Zorê petrola xam bi awayekî destpêkî bi rêya şewatoka dihat amadekirin, mazot û banzîn ji hev û du cuda dikirin û difrotin xelkê, tevî ku zirareke mezin li dû wê awaya amadekirina mazotê heye ku ew ziyanekê mezin digihîne xweza û jîngehê û xeteriyeke wê pir mezin li ser tenduristiya mirovan heye ku di encamê de nexweşiya penceşêrê bi awayekî berfireh li deverê belav bûye, lê xelk neçarbûn ku wê mazotê bikirin da ku xwe ji sermaye zivistanê biparêzin.

Demek ev (şewatoka) li deverên rêveberiya xweser hatin qedexekirin, li şûna wan pazûngehin biçûk hatin bikaranîn, lê karîn û şiyana van parzûngehan sînorkiriye û ne di wê astê de ye ku mazoteke zelal û paqij derxîne.

Mazota ku îro roj li deverên rêveberiya xweser tê firotin tevî ku arzan û peydaye lê ne zelal e û gelek madeyên jehirkirî di nav de hene.

Her sal, Ev mazota ne paqij dibe sedemê hin bûyerên xemgîn, wek şewata mal û mirovan, ji bilî bêhina wê ya genî ku dibe sedemê nexweşiyên.



Ji bo xweparastina ji ziyanên wê mazotê, welatîyekî ji bajarê Amûdê ku navê wî Enwer Ebdirehman e awayek bi ewleh afirandiye.

Di derbarî afirandina xwe de, Enwer ji kovara Welat re got:

“Ji ber ku bihna mazotê pir xurt û nexweş e, û da ku ziyan negihêja sînga zarokên min, û piştî min bihîst ku gelek bûyerên şewatê seba wê mazotê rûdane, saw bi min re çêbû lewre ez li awayekî bi ewleh geriyam da ku wê pirsgerêkê pê çareserbikim û bi vî awayî ez ghiştîm hizira çareseriyê.

Min dît ku ez debûya mazotê li derve deynim, û xertûmeke zirav lê siwar bikim û aliyê din ê xertûmê li sopa hundir siwar bikim, bi vî awayî mazot dê bigihêje sopê bêtî ku bêhin û zerera wê hebe.”

Di dûmahîka axaftina xwe de Ebdurehma hêviyên xwe anîn ziman û got:

“Dibe ku herkes nikaribe wek min bike, ji lewre ez bi hêvîme ku desteya sotemeniyê kar bike ji bo başkirina mazotê da ku ziyan û xeteriya wê li ser gel kêmbibe.” ■



تفشي ظاهرة الرصاصات الطائشة..

إلى متى!؟

ألسان كروي



فوارغ الرصاصات على شرفة منزلي..»

أما السيد هوكر محمد فقد عبر عن استيائه و غضبه من هذه الظاهرة الغير حضارية و قال :

«حياتنا أهم من احتفالاتكم بهذه الطريقة العشوائية, هناك طرق حضارية يمكن أن يعبر من خلالها الإنسان عن مشاعر الفرح و الاحتفال كالرقص و الغناء و الموسيقى و الألعاب النارية الملونة فلماذا نلجأ إلى الطرق الهمجية في احتفالاتنا؟»

وتقول السيدة جيهان أحمد و هي لا تستطيع إخفاء غضبها موجهة كلامها لمطلق الرصاص العشوائي :

«أهم شي إنكم انبسطو ليلة راس السنة ... أما أن يصاب ابني بالفزع و لا يستطيع النوم و يصرخ و يبكي دون أن يستطيع تهدئته فهذا لا يهمكم».

إن دلت هذه الظاهرة على شيء فإنما تدل على تخلف المجتمع وستكون لها عواقب وخيمة خاصة على الأجيال الناشئة حيث تساعد على انتشار ثقافة العنف لدى الأطفال

لذلك على الجهات المعنية والمسئولة اتخاذ كافة الإجراءات القانونية و الضرورية للحد من هذه الظاهرة و توجيه و إرشاد عناصرها المسلحة بضرورة عدم استعمال الأسلحة إلا في مكانها كما أن عليها تنبيه المواطنين الذين يتقدمون لترخيص أسلحتهم بأن السلاح للدفاع عن النفس وللحماية فقط وليس لتهديد حياة الأبرياء وقلب الأفراح والمناسبات السعيدة إلى مصائب عبر إطلاق العيارات النارية , كما يجب تجريم مطلق الرصاص العشوائي و محاكمتهم ليصبحوا عبرة لغيرهم. ■

بعد

تدُن المجتمع السوري واختفاء الظواهر الغريبة منه يبدو أن حالة الحرب التي دامت سنوات طويلة أدت إلى انتشار بعض الظواهر الغريبة و الخطيرة , منها تفشي ظاهرة الرصاص الطائش الناجم عن الإطلاق العشوائي للرصاص خاصة في المناسبات أو كتعبير عن مشاعر الفرح و الاحتفال.

و قد تزايدت هذه الظاهرة في الآونة الأخيرة في المدن لدرجة أنها أصبحت تشكل تهديدا جديا على حياة الناس و باتت مصدر قلق و خوف لدى المواطنين.

و يعود السبب في هذه الظاهرة إلى الانتشار العشوائي و الغير المنتظم لصنوف الأسلحة النارية بين فئات المجتمع عامة , و بالرغم من أن الجهات المعنية أصدرت التحذيرات المتكررة وأعلنتها عبر وسائل الإعلام المختلفة إلا أنها لم تنجح حتى اللحظة في القضاء على هذه الظاهرة القاتلة ربما لعدم امتلاكها آلية حاسمة لتنفيذ تلك القرارات والتحذيرات .

وقد قامت تجمعات مدنية و ناشطون مدنيون بحملات مناهضة لظاهرة الرصاصات الطائشة كما أقيمت وقفات احتجاجية في مدينة القامشلي تهدف لتوعية المجتمع بمدى خطورة تفشي هكذا ظواهر و التي تعرض حياة الأبرياء للخطر أو قد تتسبب بإعاقات دائمة لمن تصيبه, كما تم مناشدة الجهات المعنية و المختصة و المسئولة للتصدي لها والحد من انتشارها و محاسبة المتجاوزين من مطلقي الرصاص.

حول هذا الموضوع الذي بات يقلق المواطنين بشكل كبير التقت مجلة ولات مع بعض الأهالي و استطلعت آراءهم

حيث قال السيد أحمد أكرم و هو من سكان مدينة عامودا :

« استيقظت صبيحة رأس السنة بعد ليلة ماطرة بالرصاص الغزير احتفالا بقدوم العام الجديد و وجدت العشرات من

الشاعر نفسه .

في تلك الأيام كان نزار قباني في أوج ظهوره فترجمت بعض قصائده إلى اللغة الكردية ولكنني لم أحافظ عليها من الضياع كقصائد أخرى نظمها فضاقت ونظمت باللغة العربية قصائد مطولة ضاع منها الكثير ولم يبق سوى النزر اليسير.

ومن أعمالي التي فقدت رواية أسطورية تجمع بين الواقع والخيال تحت عنوان «الزبد» ورواية أخرى للآديبة الداغستانية «فازو» تحمل العنوان «عروس ذات عشرين و مائة ضفيرة»

قد يسألني سائل عن الأعمال التي صدرت لي ، و عن هذا السؤال الافتراضي أجيب :

صدر لي من الكتب زهاء ستين كتاباً أكثرها في دمشق و أقلمها في القامشلي و السويد و الخليج و ألمانيا بين عمل موضوع و عمل مترجم (و ربما صدر لي عمل باللغة العربية و الكردية مثل «هكذا تكلم - Simo»)

هذه الكلمات القليلة و المقتضبة ليست سيرة ذاتية و لا تاريخاً دقيقاً لزمان غابر عزَّ فيه اقتناء الكتاب و كانت حيازته أشبه بالحصول على «الكبريت الأحمر» الذي ينذر وجوده أو لا وجود له ، إنما هي حديث عن مرحلة شاقة من الدرس و التحصيل الذين لا يتأتيان إلا بالجهد و المثابرة. ■

شعراء النهضة و دواوين الشعر الحديث .


و في النثر درست مقامات الحريري و الهمذاني و الأدب الكبير و كليله و دمنة لابن المقفع و البخلاء و حياة الحيوان للجاحظ ، و في البلاغة و البيان و البديع «معاهد التنصيص على شواهد التلخيص» و في النحو : شذور الذهب و قطر الندى و بل الصدى و ألفية ابن مالك و شروحها . كما طالعت جميع ما كتبه و ترجمه المنفلوطي و كذلك وحي الرسالة للأستاذ أحمد حسن الزيات ..و الأعمال الكاملة لجبران خليل جبران و نهج البلاغة و أدب الكاتب و الكامل في الأدب و السيرة النبوية و العقد الفريد و الأغاني و تاريخ الأدباء القدماء و المؤلفين.

و في الرواية قرأت لشارل ديكنز قصة مدينتين و الآمال الكبيرة...والبؤساء لفكتور هيغو و رواية الشيخ و البحر و مسرحيات وليم شكسبير و برناردشو باللغتين العربية و الانكليزية أي بعد أن أخذت مبادئها من «المعلم يعقوب» الذي ظل يمارس مهنة التعليم على مدى خمسين عاماً في مدرسة الغزالي .

و لما لم يكن «المعلم يعقوب» مضلعاً من اللغة الانكليزية و كان إلمامه بها ضحلاً لم أجد لديه ما يشفي الغلة و يفي بالمرام لذلك لجأت إلى التعليم ذاتياً اعتماداً على قراءة النصوص المبسطة و العودة إلى المعاجم حتى إذا أحرزت كما هائلاً من المفردات و المصطلحات الانكليزية شرعت أترجم من الانكليزية و العربية....

فترجمت كتباً في شتى العلوم كالطب و الهندسة و الميكانيك و الجغرافية و كذلك كتباً في الرواية و القصة و الأسطورة و سواها.

أما عن اللغة الكردية التي هي عماد علاقاتنا اليومية التي عليها نشأنا و ترعرعنا فسرعان ما تعلمتها قراءة و كتابة فترجمت قصائد ل جركخوين لم أنشرها ثم قصته Reşo û darê التي نشرت بعد عامين من ترجمتها برغبة جياشة من





رحلة الشيخ توفيق الحسيني في رحاب الكتابة

«عن وثيقة بخط يده تنفرد مجلة ولات بنشرها بمناسبة الذكرى الأولى لرحيله»

وهلة سمعت من هذا الكلام الذي يطلقون عليه اسم الشعر : أبياتا من ديوان الصوفي الشاعر ابن الفارض كما سمعت قصائد في المديح النبوي للشاعر البوحيري و أبياتا للشاعر كعب بن زهير.

كانوا يرتلون بها أو يترغنون بها، فكانت هذه الأبيات و أمثالها ذريعة لشغفي بهذا اللون من القول الذي يسمونه شعرا على الرغم من غموضه و الجهل بمضمونه .

و قد حفزني التدله و هذا الشغف الى محاولة فهم فحواه فتناولت ديوان ابن الفارض أسعى إلى الوقوف على مغزى تلك الأبيات مستعينا بالشروح حتى استطعت في خلال شهور حل تلك الطلاسم و فهم تلك الرموز ، ثم بدأت أجرب مقدرتي على النظم - و ليس من باب التبجح أو المغالاة و لا التباهي- إذا قلت لقد نجحت في قول الشعر نجاحا باهرا ، و لكنني استنكفت عن قول الشعر و انتقلت إلى الكتابة النثرية بعد أن وقعت في يدي نسخة من مجلة (سندباد البحري) التي كان يصدرها الأستاذ الأديب سعيد العريان في القاهرة و كانت تصل الى عامودا كل أسبوع فبتناعها من مكتبة «ديكران ابراهيم» و هي المكتبة الوحيدة في عامودا كنت أقرأها سطرا سطرا ، جملة جملة، حرفا حرفا... كانت مواضيعها شائقة و ممتعة تجتذب القارئ بطرافة قصصها و حكاياتها و رسومها الملونة....

كانت «الحجرة» يؤمها طلاب الفقه خاصة و العلوم الأخرى عامة طلبا للعلم و كان جل أولئك يفدون إليها من خارج عامودا ، و إذ كانت هذه الحجرة قريبة من دارنا عن كذب زهاء خمسين أو ستين خطوة إزاء الجامع الكبير الذي يدعى في الوقت نفسه «جامع الشوافع» فقد كنت أحمل النسخة الجديدة من المجلة و أقصد الحجرة ، فإذا شاهدها طلبة الفقه أعجبوا بها و طلبوا إلي قراءة سطور منها فقرأها بطلاقة فيتعجبون إذ كنت آنذاك في التاسعة و لا يكتمون هذا الإعجاب الذي كان يحثني على الإكثار من القراءة و الكتابة حتى خيل إلي أنني قد تمكنت الأخذ بزمامها ، ثم بدا لي أن أدخر مخزونا من مفردات اللغة العربية فعكفت على قراءة دواوين الشعر و حفظ بعض القصائد. درست الشعر الجاهلي و الشعر الإسلامي و شعر المخضرمين و الشعر الأموي ثم العباسي و ما تلاه من شعر الانحدار و شعر

في تلك الحقبة من أزمدة الطفولة كانت لنا دار في عامودا (و كانت لنا دار في الوقت نفسه في موزان-أوركيش) تكتظ جدران إحدى غرفها بكامل مساحتها برفوف خشبية تعلوها كائنات جامدة صماء بكماء صامتة لا تنشط للكلام إلا حين تقع بين يدي أحد أصحاب العمام الفارهة الذين دأبوا على حضور مجلس والدي و زيارته بقصد التباحث و التداول في شؤون التشريع أو في أمور التفسير و الحديث أو في علوم النحو و المنطق و اللغة ..

تلك الكائنات الخرساء كانت تبدو لي كعلب مستطيلة الشكل تضم أوراقا صفراء عليها نقوش و خطوط متعرجة كأثار ديبب النمل يسمونها كتباً ، و لم أكن أجد مسوغا لوجودها (فهي لا تنفع و ربما كانت ضارة لأنها تشغل حيزا كبيرا من غرفة الاستقبال).

في أحيان كثيرة كنت ألج الغرفة و انتبذ مكانا قويا للجلوس ثم أصغي الى المتحاورين ...كنت أصغي إليهم و هم يتلفظون بأسماء غريبة تمتلي منها نفسي هلعا و رعبا و كأنها كنت أجد في ذلك لذة و متعة فأعود إلى هذا المحفل كلما سنحت لي الفرصة .

كان أحدهم يقول : عند «الزمخشري» أو يقول «سيبويه» أو يقول آخر : السيوطي .. أو الطبري فيخيل لي أنها أسماء أخواننا الجن ، فاذا خلا المجلس نظرت في حذر و خوف الى الرفوف خشية أن تخرج منها أصحاب تلك الأسماء فافتحم الباب خارجا .

فيما بعد .. بعد عامين دخلت المدرسة الابتدائية و عندئذ عرفت أن للكتاب نفعاً، انه يعلمنا أشياء لم نكن نعرفها و أن أصحاب تلك الأسماء هم كتاب كبار لهم سابقة في كثير من العلوم التي انتقلت إلينا و ليسوا عفاريت و لا مرردة من الجان .

دخلت المدرسة الابتدائية / مدرسة الغزالي / أو أنني أدخلت فيها و لما أمضيت فيها أربع سنوات من التعلم نشأت لي رغبة جادة و ملحة في الاستزادة من المعرفة فواظبت على حضور ذاك المجلس أصغي إلى الأحاديث التي يتطرحها رواد المجلس...أصغي أحيانا الى كلام موزون /مقفى/ ذي لحن و أوزان و إيقاع و موسيقى ترتاح لها النفس و تطرب من جرائها المشاعر و الأحاسيس ، و أول

SÊ HELBESTÊN MARY OLIVER

Werger: Şêrgo Dakorî

Qazên Bejî

Hewce nake tu baş bî.
Hewce nake tu li ser çogan
sed mîlî li bêlanê bimeşî ji bo tu tobe bikî.
Tenê divê tu bihêlê ajelê nerm ê laşê te
hez bike ji tiştê ku jê hez dike.
Ji min re behsa bêgaviyê bike, bêgaviya te, û ezê
behsa ya xwe bikim.
Di heman demê de dinya berdewam dike.
Di heman demê de rok û zixurên zelal ên baranê
di ser erdan re derbas dibin,
û di ser mêrg û darên kûr,
û çem û çiyayan re.
Di heman demê de qazên bejî, bilind li hewayê şîn
û paqij,
cardî berê xwe didin malê.
Bera tu kî bî, tu çendî tenê bî,
dinya xwe pêşkêşî aşopa te dike,
ban te dike wek qazên bejî, zivirû bi coş –
car bi dû carê de cihê te daxuyanî dikin
di malbata tiştan de.

* * *

Baran

Rojekê baran dihat, apê min
di hewdê gulan de paldayî bû
sar û şikestî,
ji trimbêla vêketî hatibû kişandin
trimbêla ku hin paçik tê de heşandî
digel xertûmeke dirêj
û çirisî. Bavê min
qêrîn kir,
dû re ambulans hat
dû re me gişan li mirinê nerî
dû re ambulansê ew ji wir bir.
Ji şaneşîna erdê li pêşiya xanî
ez dîsa li paş xwe zivirîm
û ez li bavê xwe geriyam, ji ber li paş me mabû,
hîn di nav gulan de rawestî bû,
ew zilamê bêtevger ê di nav herriyê de bû,
ew şêweyê hûr ê di bin baranê de bû.

* * *



Rojek havînî

Kê dinya çê kir?
Kê şaho çê kir, û hirçê reş?
Kê kullî çê kir?
Mebesta min ev kulliyê han e –
evê ku ji nav gîhê pekiya,
evê ku şekir ji destê min dixwe,
ê ku çenguyên xwe bi pêş û paş de dibe
ji dêvla
bi jor û binî de –
ê ku li dora xwe dinêre bi çavên xwe
yên girs û aloz.
Va îcar piyên xwe yên zerik hildide û
qenc ruyê xwe dişo.
Îcar baskên xwe bi lez vedike û difire
dûr.
Ez baş nizanim lave çiyê.
Ez dizanim ez çawa bala xwe bidim
tiştan, çawa ez bikevim
bi ser gîhê de, çawa ez bi çogan li ser
rûnê,
çawa ez bêkar û pîroz bim, çawa ez
bigerim li nav bexçeyan,
ji xwe ev e tiştê ku min rojê gişî kiriye.
Ji min re bibêje, gerek min çi din kirba?
Ma ne her tişt dawî dimire, pirr zû?
Ji min re bibêje, tu çi dixwazî bikî
ji jiyana xwe ya bi tenê, dirr, û
buhagiran? ■

Mary Oliver (1935 – 2019) *helbestvanek emrîkî bû. Di helbestên wê de têkiliya wê digel xwezayê û ramanên wê yên kûr tîn xuyakirin. Oliver xelata Pulitzer wergirt û diwanên wê navdarî li cîhanê gişî stendine.*



عجز القوافي

أفين يوسف

قال:
اكتبيني..
وارسمي ظلي الطويل
على مسالك الشمس
واسقني من عينيك عشق وطن
ودمع طفل
وزغردة أم شهيد
ودعي أناملك تهدد أغصاني
زيتوناً أو جلناراً
أو شرانق فراشات تشبه روحك
اكتبيني
كتاريخ كرداغ المتراحم
على صفحة السماء
أو
فدعيني أقلب راحتك
و جثامين الشهداء
فعلنها
أهبي لك قصيدة من وطن

أردت مراراً أن أكتب عفرين
أصفها في قصيدة
وألملم أوراق
وبعثرات الحروف
أجمعها تحت ظل زيتونة
وأعصر منها زيت القوافي
لكن...
لم تسعفني لغتي
عجزت عن ترجمة المجازر
عن وصف صراخ اختنق في
الحناجر
عجزت عن وصف رصاصة
اخترقت صدر تائر
وجلست مكسورة كقلمي
وفي غمرة الهزيمة
جاءني
حاملاً في كفه وعداً وقسماً



تفشي ظاهرة الرصاصات الطائشة.. إلى متى...؟!



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat

ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (٥٩) ٢٠١٩/٢/١ م